



# Bernameya aboriyê

KURMANJI

**Barnameya aboriyê  
bernameyeka amedekirinê  
ji bo xwendina bilind e û  
bidestxistina dîplomeya  
amadebûna ji bo xwendina  
bilind armanca wê ye.**

Bernameya aboriyê ji te re ye yê ku hez dike civaknasiyê û bi taybetî aborî û hiqûqê bixwîne. Ev program ji bo te jî ye yê ku hez dike fêr bibe ka mirov çawa şîrketan ava dike, bi rê ve dibe û pêş dixê. Ev xwendin ji bo domkirina xwendina aborî, hiqûq û warên din yê civaknasiyê di perwerdeya bilind de bingeh e.

## DU PISPORIYÊN CUDA

### Aborî

- Tu dê zanyariyan li ser warên aboriya şîrketan wek rewackirin, raporkirina hesaban, hesabkarî, birêveberî û rêxistinê werbigirî. Tu dê fêrî avakirin û birêvebirina şîrketan bibî.

### Hiqûq

- Tu dê zanyariyan li ser giringiya sîstema dadgeriyê di civakê de û ka dadgeriya navneteweyî çawa tesîrê lê dike werbigirî. Tu dê şiyana xwe ya analîzkirin û biryardanê di heqê pirsên hiqûqî de pêşde bibî.

## Tiştên ku tu di vê bernamê de fêr dibî

Tu dê zanîna xwe di warê aboriya civakê, aboriya şîrketan, şîrketkarî, hiqûq û psîkolojiyê de pêşde bibî. Tu dê rewşên aborî di civakê de, ticareta di navbera welatan de û rol û berpirsiyariya şîrketan di cîhaneka globalîzekirî de bixwînî. Tu dê fêrî rêyên çareserkirina pirsgerêkên şîrketan bibî. Tu dê haydar bibî ka mirov çawa difikirin, his dikan, bazarî dikan û bi mirovên din re didin û distînin. Tu dê zanyariyan li ser giringiya sîstema dadgerî di civakeka demokratîk de werbigirî û haydar bibî ku dadgeriya navneteweyî tesîrê li qanûndanîna me dike. Tu dê şiyana xwe ya analîzkirin û biryardanê di heqê pirsgerêkên hiqûqî de pêşde bibî.

## Bername weha hatiye rêxistin

Madeyên dersê di bernamê aborî de madeyên lîseyê yê hevbeş in: îngilîzî, dîrok, werziş û tenduristî, matematîk, zanist, zanyariyên dînî, zanyariyên civakê û zimanê swêdî yan swêdî wek zimanê duyê.

Di bernamê amadekirina ji bo xwendina bilind de, tu kursên teorîk yê zêdetir ji yê bernamê pîşeyî dixwînî.

Madeyên taybetmend yê hevbeş yê bernamê ev in: aboriya şîrketan, hiqûq, zimanên serdem û psîkoloji.

Îmkan heye ku tu di bernamê de xwe pisportir û zanatir bikî. Ji wê re bernamêkûrkolîn (programfördjupning). Ev dikare madeyên wek felsefe,

cografîya, danûstandina grafîk, birêveberî û rêxistin, matematîk, komunîkasyona medyayî, zimanên serdem, psîkoloji û civaknasî. Ji xwendîngê bipirse ka ew kîjan kursên kûrlêkolînê dide.

Hilbijartina ferdî jî heye ku tu dikarî wê ya ku tu dixwazî bixwînî hilbijêrî. Ji xwendîngê bipirse ka kîjan kurs hene.

### **Awayên xebatê**

Tu dê bi rexneyî li agahdariyan bigerî, wan analîz bikî û binirxînî. Tu ji pîrsgirêkên girêdayî aboriya civakê, aboriya şîrketan û hiqûqê yên ku tu dê bi serê xwe yan bi yên din re çare bikî hereket bikî. Ev dê şiyana te ya hizirînê li ser bîngê dîtînê cuda û jêderxistina encaman û mînaqêşkirinê li ser bîngê têgeh, teorî û modelên serekî pêşde bibe. Tu dê xwe hîn bikî ku bi rêyên zanistî encamên xwe rêkûpêk bikî û pêşkêşî komeka diyarkirî bikî.

### **Projeya lîseyê**

Tu dê di dawîya Bernameya aboriyê de projeyeka lîseyê amade bikî. Tu dê pîrsekê hazir bikî û karekê mezin yê ku li ser warên zanyarî yên girîng yên bernameyê ava dibe plan bikî, pêk bînî û hilsengînî.

### **Balkişandin**

Giring e ku tu xwendina xwe plan bikî heger tu bixwazî şertên taybetî yên xwendineka bilind bi dest bixî. Heger tu bixwazî hêjî bixwînî, li gel rêberekê xwendin û pişeyê biaxive.

Hergav mafê te heye ku tu di çarçoveya hilbijartina ferdî de kurseka din ya zêde di warê werziş û tenduristiyê de û kurseka hunerê hilbijêrî.